# Êvarek Bi Rengê Esmerê



**Hesen Silêvanî -Duhok**

Dîwar jî bi rewşbûn
Şeva te çavê Xwe deynay ser dilê Min
Te di dît pêlên kenî
Çewa di pirça wê ya reş da
şewq didan?
- Esmer.... Esmer...Hez ji te dikim esmerê!!

Te dît çewa min dilê Te yê di ûdêve difirî
Bê hûş girt û kire di paxla xwe da?
Kiçê Macên wê şevê Çend xweşbûn !!
Li bîra tene ma ne ?
Ew çewa kenî ji çavê Te yê çepê Diza?
Baş bû lêvên te xwe li ber didanên te girtin û
Sîlavên xwînê jê nezan !!
- Esmer... Esmer...Hez ji te dikim esmerê
Can were şevek dîjî
Wek wê şevê Bijîn
Berî di gel axê Bi buhjîn
Esmer.............Esmer......Hez ji te dikim esmerê-

Adara 2007